şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 508 19-Kanûn-2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Bijîşksaziya şûngir û dermankirina fîzîkî li Şehbayê





Idrîs HENAN

Di çarçoveya avakirina bedeneke tendirust de, karguzariya tendirustiyê xwedî cihekî girîng e. Bi pêşketina zanyarî û teknolojiyê re, cureyên dermanên nexweşiyên nenas jî zêde bûn. Lê tevî van pêşketinan jî, beşek mezin ji civakê berê xwe dide Bijîşksaziya Şûngir ku pala xwe dide giya, şînber û berhemên xwezayî.

**BI MESACÊ XELKÊ DERMAN DIKE**

Ehmed Mihemed Heftaro hemwelatiyê Efrînê dîplomeya Bijîşksaziya Şûngir beşa mesac û dermankirina fîzîkî ji enstîtuyên Çînê yên li Rojhilata Navîn wergirtiye. Heftaro ji zû ve nexweşiyên rehan, derzika piştê, navdergan û hwd bi rêbazên fîzîkî derman dike. Heftaro di vê derbarê de got: Gelek mirovên ku serdana me dikin, baweriya wan bi vê rêbaza gelêrî ya şîfakirinê heye. Pir nexweşiyên damar, rehên livokî, rehên mejî, janên cur be cur ên piştê, janên çongan, navdergên derziya piştî, stû û gelek ên dîtir em bi riya misdan û mesaca profesyonal derman dikin.

Heftaro girîngiya karê xwe dinirxîne û dibêje: Ji bona her lebateke bedena mirov, di mejî de jîdera fermanê heye. Fermanên mejî bi riya damarên xwînê û tevneke mezin a rehan digihin endama pêwîst. Heftaro dewam dike: Dema ku di riya fermanê de pirsgirêk derkeve, yan jî alava veguhezîner bi xwe nexweş be, wê çaxê ew dibe sersebebê hinek nexweşiyên nola felcê, tevizandin û janên cuda cuda ku bandoreke xirab li jiyana mirovan dike. Rêbaza me jêdera nexweşiyê kifiş dike û çareser dike.

**HEMÛ DERMANÊN ME XWEZAYÎ NE**

Heftaro di nav nirxandinên xwe de tekez kir ku; îlaca bi bijîşksaziya altirnetîf û bi dermanên xwezayî ji ya kîmyawî bi feydetir in û wiha dewam kir: Em qet dermanên di fabrîkeyan de hatine çêkirin bikar nînin. Hemû dermanên me xwezayî ne. Ji wê jî wêdetir beşa me ya îlacê pala xwe ji vexwarina derman pirtir dide mesacê. Bi riya mesacê jêderên janan di bedena mirov de tê îlackirin. Ji bona wê jî em gelek cureyên rûn û zeytê bikar tînin. Gelek cureyên zeytê em tevlihev dikin û dermanên pêwîst li gorî nexweşiyan ava dikin. Heftaro destnîşan kir ku ev yek gelek bi baldarî çêdibe û got: Zeyta ku em bi kar tînin jî xwezayî ye. Ji berhemên xwezayê yên weke qernefîl, zeytûn, bihîv, sîrec, ava germ,… hwd in.

**LÎSK BI NEXWEŞIYAN RE NÎNE**

Heftaro sedemên nexweşiyan vedigerîne xemsarî, xizanî û kêmderfetiya mirov ku demildest tendirustiya xwe naşopîne û ev tişt got: Beşek mezin ji civaka me xizan e. Hewl dide êş û janên xwe bi xwe derman bike. Heya ku nexweşî lê qert nebe li xwe napirse. Ew nizane ku êşa parçeyekî wê sibe bibe sersebeba êşa gelek parçe û cihên dîtir ên laşê însan. Ji ber vê pêwîste mirov ne xemsar be û di vî warî de haydar be. Bi nexweşiyan re lîsk çênabe.

**EM XWEDÎ TECRUBEYA DÎROKÎ NE**

Dermankarê fîzîkî û mesacîst Ehmed Mihemed Heftaro rewşa kêmderfetiyê jî nirxand û got: Piştî dagirkirina Efrînê û derbederbûna gelê me, şêniyên Efrînê di nav xirbe û bêrderfetiyên jiyanê de li Şehbayê dijî. Rejîma Baas jî dor li Efrîniyên li Şehbayê dimînin şidandiye û ji bo hinek qezencên siyasî ambargo avêtiye ser me. Ji ber vê helwesta dijminana ji gelê Kurd re alav, amûr û hinek cureyên dermana xwezayî li van deran dabîn nabin. Ev jî karê me heya radeyekê asteng dike û bandorê li tendirustiya gelê me li Şehbayê dike. Heftaro di dawiyê de tekez kir: Em bi rêbaza dermankirina ku pala xwe dide berhemên xwezayî, misdan û mesaca profesyonal tendirustiya gelê xwe diparêzin. Em ê bi zanista ku bav û kalan dewrî me kirine li kêleka gelê xwe heya rizgarkirina Efrînê li ber xwe bidin. Gelê me xwedî tecrubeya dîrokî ye. Di her dem û zemanî de ji tunebûnê hebûnê çêdike.

# Dibistana Nimûr di Tûrnûvaya Tekwandoyê de bi serket



Dibistana Nimûr a Tekwando xelata yekemîn a Tûrnûvaya Herêma Cizîrê ya werzîşa taykwendo ya beşê mêr wergirt.

Yekîtiya Werzîşê roja 16'ê Kanûnê tûrnûvaya werzîşa Taykwendo yên beşa jin, zarok û ciwanan li hola Senabil a bajarê Hesekê birêxistin kiribû. Beşa Jin ya Dibistana Nimûre ya Tekwando xelata yekemîn girtibû. Dîsa jî heman dibistanê beşa mêr xelat wergirtin.

48 lîstikvan di nava 6 tîman de beşdarî tûrnovaya Herêma Cizîrê ya Tekwando bibûn "Dibistana Nimûr a Hesekê, Navenda Amûdê, Navenda Dêrik, Siqûr, Roj û Berxwedan".

Tûrnovaya 16'ê Kanûnê bi axaftina destpêkê ji hêla berpirsê werzîşa taekwendo yê Herêma Cizîrê Ebdulezîz Abî ve hate kirin. Abî kêfxweşiya xwe bi rêxistinkirina tûrnovayê anî ziman.

Her wiha Abî destnîşan kir ku serkeftina her tîmek an jî lîstikvanek tê wateya serkeftina tûrnovayê û hemû lîstikvanên ku beşdar bûn. Ji ber ku di şertên zehmet de ev Tûrnûva pêk hat.

Di dawiyê de Abî hêvî kir ku hejmara beşdarên tûrnovayê di sala bê de ji ya îsal zêdetir be.

Piştre tûrnovaya beşa mêr û ciwanan destpê kir û rojekê berdewam kir.

Di tûrnovayê de 20 lîstikvanên ku beşdarî gelek tûrnovayên navdewletî û herêmî bûne lîstin.



Tûrnova bi serkeftina dibistana Nimûr bi dawî bû...*ANHA*




şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 508 19-Kanûn- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Gelê Şengalê ji bo vekirina korîdorê li ser sînor e




Ji ber êrîşên çeteyên DAÎŞ'ê yên di sala 2014'an yên li ser Şengalê de Korîdora Mirovî ya Rojava-Şengalê hatibû vekirin. Ev korîdor di 15'ê Kanûnê de ji aliyê Iraqê de hate girtin. Gelê Kurd û Ereb û ciwanên Şengalê û ji bo vekirina korîdora mirovî ya di navbera Rojava û Şengalê çûn ser xeta sînor û çalakiya xwe dewam dikin.*R-2*

## Li dijî êrîşên dewleta Tirk em bi QSD'ê re ne




Bertekên gelê Ereb yên li dijî êrîş û gefên dewleta Tirk yên li dijî Bakurê Sûriyê zêde dibe. Şêxê Êla El-Bû Essaf, Ubeyd Xelîl El-Hesan diyar kir ku serokê rêjîma Tirk Erdogan dixwaze hevgirtina civakî ya li herêmê têk bibe û got, "Li dijî her êrîşeke li ser axa me em amade ne li cem QSD'ê cihê xwe bigirin û axa xwe biparêzin." *R-4*

## Tirkiye ne tenê ji bo Kurdan ji bo hemû Cîhanê metirsiyeke



Berpirsyarê Têkiliyên Derve yê TEV-DEM'ê Salih Muslim diyar kir dewleta Tirk li dijî hemû Kurdan şer îlan kiriye û got, "Tirkiye bi vê siyaseta xwe ne tenê ji bo Kurdan, ji bo hemû Rojhilata Navîn û cîhanê metirsî ye. Em li dijî êrîşan bi hêza gelê xwe, bi rêxistinbûn û berxwedana xwe piştrast in." *R-4*

## Dewleta Tirk ji bo tevahî Sûriyê xeteriyek e



Endamê Desteya Rêveber a Partiya Yekîtiya Suryan Afram Îshaq diyar kir dewleta Tirk ji bo tevahiya Sûriyê metirsiyeke û da zanîn ku divê hemû gelên herêmê li dijî dagirkeriyê têkoşîna xwe xurt bikin. Îshaq got, "Ji bo ku em li hember gefên Tirkiyê bisekinin û herêmên xwe biparêzin divê em yekîtiya xwe ava bikin." *R-4*

## Divê gelên Sûriyê li dijî êrîşan yekîtiya xwe ava bikin



Hevserokê Meclîsa Zagonsaz ê Herêma Efrînê Silêman Cafer derbarê gefên Tirkiyê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de axivî û diyar kir ku gelên Sûriyê wê li hember êrîşan li ber xwe bidin. Cafer got, "Girînge ku gelên Sûriyê li dijî van gef û êrîşên Tirkiyê yekîtiya xwe ava bikin." *R-4*

# TECRÎD GIHÎŞTIYE ASTEKE XETERNAK

**Tecrîda gîran ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku gihiştiye asteyeke xeternak êdî roj bi roj fikaran zêde dike. Gelê Kurd û dostên xwe ji bo ku tecrîda li ser Rêber Ocalan bişkînin û agahiyê jê bigirin têkoşîna xwe mezin dikin.**

## ÇALAKÎ BÊ NAVBER DEWAM DIKIN

Li Rojavayê Kurdistanê çalakiyên li dijî tecrîdê bê navber dewam dikin. Gelê Rojava ji bo ku tecrîda li ser Rêber Ocalan bişkîne şev û roj di nava tevgerê de ye. Bi vê armancê çalakiyên greva birçîbûnê ku bi pêşengiya Kongra Star û PYD'ê yên li dijî tecrîdê hatine destpêkirin bajar bi bajar berdewam dikin.



## LI DIJÎ TECRÎDÊ WÊ TÊKOŞÎN BIDOME

Kongreya Star li herêma Şehbayê bi tevlêbûna bi sedan jinan çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin. Jinên ku tevlî çalakiyê bûn diyar kirin ku heta azadiya Rêber Ocalan ew ê têkoşîna xwe dewam bikin. Dîsa bi tevlêbûna bi sedan welatiyan li navçeya Dirbêsiyê jî çalakiya greva birçîbûnê hat lidarxistin. *R-2*

## Ciwanên Minbicê li ber dagirkeriya dewleta Tirk rabûn



Bi dehan ciwanên Minbicê bi daxuyaniyekê dagirkeriya dewleta Tirk ya li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê şermezar kirin. Di daxuyaniyê de hat gotin ku berdêla wê çi dibe bila bibe ewê bersiva êrîşa li ser xaka xwe bidin û biparêzin. Her wiha ciwanan bang li welatiyên Sûriyê kirin ku li dijî dagirkeriyê xaka xwe biparêzin. *R-5*

## Gelê Reqayê got `Na ji dagirkeriya Tirkiyê re"



Bi sedan welatiyên bajarê Reqayê bi armanca şermezarkirina gefên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi dirûşmeya "Na ji dagirkeriya Tirkiyê re" meşiyan. Di meşê de diruşmeyên li dijî dagirkeriya Tirkiyê hatin bilindkirin. Di meşê de axaftin hatin kirin û hat gotin ku wê gelên Bakurê Sûriyê ti carî dagirkeriya Tirk qebûl neke. *R-2*

## Em ê li dijî êrîşan axa xwe biparêzin



Endamên sazî û meclîsên bajarokê Til Hemîsê bi daxuyaniyekê êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê şermezar kir. Di daxuyaniyê de hat gotin ku wek gelên herêmê yên Ereb, Kurd, Suryan û Tirkmen, li dijî êrîşan emê, ax û destkeftiyên biparêzin. *R-5*

## Emê li dijî êrîşan li ber xwe bidin



Nerazîbûnên welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên li dijî gef û êrîşên dewleta Tirk yên li ser herêmên wan zêde dibe. Jinên Reqayê diyar kirin ku ew ê piştgiriya QSD'ê bikin û li dijî êrîşan axa xwe biparêzin. Jinên Reqayê bang li hemû gelên herêmê kirin ku li dijî êrîşan bibin yek. *R-3*

## Gelên Sûriyê wê rê nedin dagirkeriya Tirkiyê




Bi armanca şermezarkirina êrîş û gefên dewleta Tirk ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li Şehbayê bi sedan kesî bi durûşmeya "Bimre dagirkeriya Osmaniyan û bijî vîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê" meşek lidarxist. Kesên ku di meşê de axivîn diyar kirin ku ew ê gelên Sûriyê li hember êrîşan li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin. *R-2*

## Em ê xwîna şehîdên xwe li erdê nehêlin



KJK'ê ji malbata ku di êrîşa dewleta Tirk ya li ser Mexmûrê de şehîd bûn re sersaxî xwest û got, "Em ê xwîna wan li erdê nehêlin." KJK'ê diyar kir ku Gelê Mexmûrê çawa ku berî bi 25 salan xwe radestî faşîzmê nekir, serî netewand, bi sekna xwe ya îro jî peyameke xurt daye serçete Erdogan." *R-3*

Xwe parastin mafekî herî rewa ye — Avesta AMARGÎ — R-3
Dagirkeriya Tirk tenê bi .... — Zekî BEDRAN — R-5
Tecrîd, despêka şerê 3. yê Cîhanê ye — Medeni FERHO — R-6
Gel li hember zulmê bi biryar e — Hozan Seyîdxan — R-7

# Gelên Sûriyê wê rê nedin dagirkeriya Tirkiyê

Bi armanca şermezarkirina êrîş û gefên dewleta Tirk ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li Kantona Şehbayê bi sedan welatiyên li Herêma Efrînê û Kantona Şehbayê daketin qadan.
Bi dirûşma 'Bimre dagirkeriya Osmaniyan û bijî vîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê' bi sedan welatiyên Efrîn û Şehbayê daketin qadan û gotin: "Em ê li dijî hemû gefên dagirkeran berxwedana xwe bidomînin."
Di meşê de wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bi dehan cangoriyan azadiyê û pankartên bi nivîsên weke "Na ji dagirkeriya dewleta Tirk li ser axa Sûriyê re" hatin hilgirtin.
Meş ji destpêka gundê Babinêsê ya girêdayî Navçeya Fafînê dest pê kir û bi dirûşmên weke " Bijî berxwedana Efrînê, Bê Serok Jiyan nabe, bimire dagirkeriya dewleta Tirk" heta hola gundê Babibnês bi dawî bû.
Hevseroka Federaliya Bakurê Sûriyê Hediye Yûsif, li ser navê gelê şehbayê Îsmaîl Mûse, li ser navê gelê Efrînê Şaziye Ibrahîm axaftin kirin.
Di axaftinê de wiha hat gotin: "Îro dewleta Tirk a dagirker bi gefên xwe li ser bakur û rojhilata Sûriyê careke din dixwaze dagirekriyê bike, her wiha gefên ku li ser Sûriyê tê kirin ne tenê li ser gelê kurd e, li ser hemû pêkhateyan e. Erdogan li dijî pirojeya civaka Netewa Demokratîk e. Ji ber ku Hemleya bagara cizîrê ber bi dawî ve diçe û teror jî bi dawî dibe Erdogan bi êrîşên xwe temenê xwe û çeteyan dixwaze dirêj bike. Gelê ku îro li hember hemû êrîş û gefan li ber xwe didin bi yek dengî dibêjin em ê tu carî serî ji dagirkeriyê re netewînin û em ê rê nedin Erdogan ku derbas Sûriyê bibe."




**Bi armanca şermezarkirina êrîş û gefên dewleta Tirk ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li Şehbayê bi sedan kesî bi durûşmeya "Bimre dagirkeriya Osmaniyan û bijî vîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê" meşek lidarxist. Kesên ku di meşê de axivîn diyar kirin ku ew ê gelên Sûriyê li hember êrîşan li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin.**

## Gelê Şengalê ji bo vekirina koorîdorê li ser sînor e



Gelê Kurd û Ereb piştgirî dan ciwanên Şengalê û ji bo vekirina koorîdora mirovî ya di navbera Rojava û Şengalê çûn ser xeta sînor.
Ji ber êrîşên çeteyên DAÎŞ'ê yên di sala 2014'an de Koorîdora Mirovî ya Rojava-Şengalê hatibû vekirin. Ev korîdor di 15'ê Kanûnê de ji aliyê Iraqê hate girtin. Koorîdora mirovî ji bo pêdiviyên jiyanê û tendirustiyê ji aliyê YPG-YPJ û ciwanên Êzidî hatibû vekirin. Piştî girtina koorîdora mirovî ciwanên Şengalê li ser xeta sînor a Rojava û Şengalê kon vegirtin û dest bi protestokirina biryarê kirin.
Li Şengalê gelek Kurd û Ereb çûn ser xeta sînor û piştgirî dan ciwanan. Gel li vê derê biryara hikumeta Iraqê protesto kirin.
Gel ê ku xwest xeta sînor derbas bike û xwe bigihîne koorîdorê ji aliyê hêzên Iraqê ve hatin astengkirin.
Gel ê ku dixwaze koorîdor were vekirin, niha li ser xeta sînor e.

## Em xwedî li daxwazên Leyla Guven derkevin

KCD'ê got, "Hevseroka me Leyla Guven 40 roj in di greva birçîbûnê de ye. Em bang li hemû gelê xwe, derdorên demokrat, sazî û dezgehên neteweyî û navneteweyî dikin ku bila di vî warî de bihistyar bin.
Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û parlementera HDP'ê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan 40 roj in di greva birçîbûnê de ye. KCD'ê derbarê çalakiya Leyla Guven daxuyaniyeke nivîskî weşand.

**TECRÎD KAOSA CIVAKÎ KÛR DIKE**

Di daxuyaniyê de ev tişt hate diyarkirin:
"Daxwaza hevseroka me gelekî zelal e. Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatiye kûrkirin. Ev tecrîd çawa ku di warê exlaqî, mirovî û hiqûqî de nayê qebûlkirin, di warê polîtîk de jî nayê qebûlkirin. Ev tecrîd kaosa civakî kûrtir dike û nahêle ku aştiyeke civakî pêk were.
Ji bo ku di her warê jiyanê de aştî û normalbûn pêk were divê daxwaza hevseroka me Leyla Guven baş were fêmkirin. Ev daxwaz di heman demê de daxwaza gelê me ye jî.
BANG
Hevseroka me Leyla Guven 40 roj in di greva birçîbûnê de ye. Em bang li hemû gelê xwe, derdorên demokrat, sazî û dezgehên neteweyî û navneteweyî dikin ku bila di vî warî de bihistyar bin."

## Welatiyên Dirbêsiyê ketin greva birçîbûnê



Welatiyên navçeya Dirbêsiyê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan û piştgiriya çalakiya parlamentera HDP`ê Leyla Guven, du roj çalakiya greva birçîbûnê lidarxistin.
Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) û Kongreya Star bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya Leyla Guven û bi dirûşmeya "Em ê tecrîdê hilweşînin û faşîzmê tune bikin" li navçeya Dirbêsiyê ya kantona Hesekê çalakiya greva birçîbûnê lidarxistin.
Konê çalakiyê li Çerxerêya Serêkaniyê ya Dirbêsiyê hate vedan. Li konê çalakiyê wêneyên Leyla Guven û wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatin daliqandin.
Bi sedan şêniyên navçeyê tev li grevê bûn…*ANHA*

## Gelê Reqayê got `Na ji dagirkeriya Tirkiyê re"

Bi sedan welatiyên bajarê Reqayê bi armanca şermezarkirina gefên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi dirûşmeya "Na ji dagirkeriya Tirkiyê re" meşiyan.
Bi sedan welatiyên xeta El-Şamiye (El-Kesrat, Retle, El-Ekreşî û El-Mensûra) li dijî gefên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê meşek li darxistin.
Meş ji herêma Retle destpêkir heta gundê Kesra Mihemed Elî dewam kir. Di meşê de diruşmeyên li dijî dagirkeriya Tirkiyê hatin berzkirin.
Di meşê de pankartên "Na ji dagirkeriya Tirkiyê re" hatin hildan.




## Greva birçîbûnê ya bê dawî û bêdorveger hate destpêkirin

Ji bo protestokirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li bajarê Strasboûrgê yê Fransayê 18 Kurdistaniyan dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bê dawî û bêdorveger kirin.
18 kes tevlî çalakiya greva birçîbûnê ya li bajarê Strasboûrgê ya Fransayê bûne. Çalakî li pêşiya avahiya Konseya Ewrûpayê tê lidarxistin. Siyasetmedarê Kurd Mûstafa Sarikaya, parlementera HDP'ê ya berê Dîlek Ocalan û Hevserokê KCDK-E'yê Yuksel Koç jî tevlî çalakiyê bûne.






# Parêzvana çand û hûnera Kurdî

**Hunermenda Kurd Eyşe Şan bi salan di stranên xwe êş û xweşiyên di civaka Kurd de anî ziman. Di şertên herî zehmet yên di nava sîstema faşîst ya Tirk de wê stranên Kurdî got. Wê qedexe û astengî nas nekir. Tevî ku 22 sal li ser mirina wê re derbasbuye jî stranên wê bi kêfxweşiyeke mezin di nava Kurdan de tên guhdarkirin.**

22. salvegera mirina hûnermend û dengbêja navdar a Kurd Eyşe Şan e. Eyşe Şan di sala 1938'an de li bajarê Amedê ji dayîk dibe. Ji ber bavê Eyşe Şanê jî dengbêje, di nava dîwanên dengbêjan de çavê xwe li dinyayê vedike. Eyşe Şan cara yekê di cemaetên jinan yên li Amedê de bi gotina Îlahiyan dest bi jiyana xwe ya hûnerê dike.
Hûner û dengbêjiya xwe dispêre êşên ku civak dijîn, rexne li paşverûtiya pergala mêr digire û herî zêde jî li dijî zêhniyeta Tirkperest parêzvantiya çand û zimanê Kurdî dike. Di demeke ku Kurd di her aliyekî de tê înkarkirin de ew bi kilam û hûnera xwe li dijî vê sîstema înkarger û asîmîlasyonîst bi wêrekiyeke mezin disekine.
Eyşe Şan di demeke ku feodalîzm û zextên li ser jinê dijwar de dengbêjiyê dike. Hewldana wê ya yekem a hunerî di cemaeteke jinan ya Amedê de bi gotina îlahiyan dest pê dike. Lê, zextên civakê û paşverûtiya tê ferzkirin nahêle Eyşe Şan li Amedê hûnerê bike. Neçar dimîne berê xwe bide Dîlokê.
Li Dîlokê gava xwe ya yekemîn a hûnerî davêje. Lê, ji ber zimanê serdest Tirkiye di radyoya Dîlokê de du salan stranên Tirkî dibêje. Di sala 1963'an de ji ber pirsgirêkên madî berê xwe dide bajarê Stenbolê û li wir konserên Kurdî û Tirkî dide. Li vir bi strana 'Ez Xezalim' deng vedide. Piştre kasêta xwe ya yekemîn derdixe.
Lê, navdarbûna Eyşe Şanê zextên li ser kêm nake, berovajiyê wê zêdetir dike. Ji ber stranên Kurdî di vê demê de qedexeye, Eyşe Şan êdî nikare bidomîne û berê xwe dide xerîbiyê ango Elmanya yê.
Li vir hewl dide hem bijî hem jî hûnera xwe bidomîne. Di vê demê de keça xwe Şehnaz a 18 mehî ji dest dide. Di warê hestî de jî demeke zehmet derbas dike û di vê demê de strana 'Qederê' a bi nav û deng derdixe.
Piştî demekî şûnde careke din dixwaze vegere Stenbolê. Lê, jiyana wê ya Stenbolê wek hêvî dike nameşe. Ji ber stranên Kurdî yên dibêje gef lê têxwarin û zext lê tê kirin. Eyşe Şan di vê demê de dayîka sê zarokane. Zarokên wê jî ji ber zextên li ser wê terka dayîka xwe Eyşe Şanê dikin. Eyşe Şan bi tena xwe dimîne.
Eyşe Şan di sala 1979'an de berê xwe dide paytexta Iraqê Bexdayê. Di radyoya Bexdayê de bi navê Eyşe Şana Elî dest bi stran gotinê dike. Li ser vexwandina waliyê Hewlêrê yê wê demê tê Hewlêrê û konser dide. Li vir fersendê naskirina gelek hûnermend û dengbêjên Kurd dibîne. Bi germî ji aliyê Kurdên hemû deverên Başûrê Kurdistanê ve tê pêşwazîkirin. Li Bexda, Dihok, Kerkûk û Hewlêrê bi hunermendên mîna M. Arifê Cizîrî, Îsa Berwarî, Gulbihar, Tehsîn Teha, Nesrîn Şêrwan û gelek kesên din re derket ser dikê û bi hevre ji bo gel konser dan. Herwiha bi gelek kesayetî û hunermendên Kurd re hevdîtin pêkanîn.



Ey Şan di nava civata Kurd de bi navên mîna Eyşana Kurd, Eyşe Şan, Eyşe Xan, Eyşana Osman, Eyşana Elî û Ayşa Şan tê nasîn.
Di nava jinên Kurd yên hunermend de Eyşe Şan navekî naskirî û weke Meryem Xan, Nesrîn Şêrwan, Elmas Xan û yên din şopeke dewlemend a hûnera Kurdî li pey xwe hiştiye ye.
Eyşe Şan stranên gelêrî, siyasî û bûyerên jiyana wê eleqeder dikin, gotiye. Stranên wê yên navdar ku di civaka Kurd de tê zanîn: Mem û Zîn, Lê lê Bêmal, Zerî Heyran, Cemîle, Bêrîvanê, Koçerê, Meyro, Qederê Yar, Xerîbim Dayê, Newroz û Welatê min Diyarbekir stranên Eyşe Şanê yên binav û bangin.
Tevî ku gelek dixwast biçe cihê jê dayîk bûye, Amedê jî lê, ji ber zextên civakî nekarî bizivire.
Hezkirin û piştgiriya dayîka wê li hember van zextên civakî têrê nedikir Eyşe Şana xwe vegerîne Amedê.
Eyşe Şan di dawiya temenê xwede êşên mezin jiyan kir û di nava tenêtî û xîzaniyê de bi nexweşiya penceşêrê dikeve. Di 18'ê Kanûna sala 1996'an de li nexweşxaneyeke Îzmîrê de diçe ser dilovaniya xwe.
Tevî wesiyet dike, wê li Amedê defin bikin jî li gorî têgotin ji ber pirsgirêkên madî zarokên wê nekarîne wê bînin Amedê. Niha jî gora wê li bajarê Îzmîrê yê Tirkiyê ye.

## Yekemîn pêşbirka kurteçîrokê taybet bi jinê

Di bin Siya Desteya çand û Hunerê ya Herêma Cizîrê de Weqfeya Jinên Rewşenbîr dê cara yekemîn pêşbirka Kurteçîrokê taybet bi jinê di 20 Kanûnê de ser rojekê li Qamişlo li darbixin. Her wiha dê her sal mîna vê pêşbirkê li darbixin û di her salê de jî bi navê jinek helbestan anjî rewşenbîrek jin be çi herêmê anjî cîhanî be. Ku di pêşbirka yekemîn de bi navê helbestvana kurd "Mestura Erdelanî" li Hola Zana bê li darxistin.
Têkîldarê mijarê Rêvebira Weqfeya Jinên Rewşenbîr Ahîn Mihemed got: "Di pêşbirkê de çi jina xwedî berhemên helbest, Nivîs û çîrok be dikare beşdar bibe, her wiha ew kurteçîrok bi zimanê Kurdî, Erebî û Sûriyanî be."
Her wiha mercên beşdarbûna pêşbirkê jî evin: Nabe ku berhem bê xwendin beriya niha hatibe weşandin. Her wiha pêşbirk di wê rojê de ew hemû çîrokên beşdar werin xwendin.




Çîrok bi ponteya ango ew kurteçîrok zêdeyî 12 rêzan an jî zêdeyî sê rûpelan derbas neke.
Ahîn Mihemed diyar kir ku berhem heya 15'ê Kanûnê hatin pêşwazîkirin û wiha bi dawî kir: "Piştre deriyê pêşwaziyê hat girtin, her wiha heya niha 14 berhemên kurteçîrok hatine 11 bi zimanê Erebî û 3 bi kurdî ne."
Hêjayî gotinê ye ku di pêşbirka kurteçîrokên taybet bi jinê tenê xelata yekemîn heye û ya ku bi serbikeve wê xelata diryê werbigre." ***Ronahî/Qamişlo***



## Fîlma Sûr ê wê di demeke nêz de bê weşandin

Endamê Sînemaya Çiyê (Sîne Çiya) Emîn Engîzek diyar kir, ku li gel şerê giran jî ew karê xwe yê sînemaya çiyê didomînin û got, di demeke nêz de wê fîlma 'Sûr', bê weşandin.
Endamê Sîne Çiya ya TEV-ÇAND'ê Emîn Engîzek, qala rewşa dawî ya sînema çiyê kir.
FÎLMÊN NÛ
Engîzek qala projeyên xwe yên nû kir û got, "Niha li ber destê me projeyên nû hene. Em çend projeyan bi hev re dimeşînin. Niha karê fîlmê 'Sûr'ê qediya. Weke ku tê zanîn li navçeya Sûr a Amedê sala 2015'an berxwedaneke mezin hebû. Me fîlmê vê berxwedanê kişand. Bû projeyeke gelekî baş. Dîmenên wê hatin kişandin û niha montaja wê dewam dike. Di demeke nêz de wê were weşandin. Wekî din projeya bi navê 'Dema Dirîreşkan' heye. Kişandina dîmenên wê jî hindik maye biqede. Me fîlmekî kurt jî amade kir. Fîlmê bi navê 'Berfîn'. Li ber destê me projeyeke nû heye, lê hîn zû ye ku der barê wê de agahî bê dayin. Weke min got, fîlmên din wê di demeke nêz de bên weşandin û her kes wê bibîne."

**BALAFIRÊN ŞER NE XEMA ME YE**

Di dawiya axaftina xwe de Emîn Engîzek got, "Dijmin propagandayeke mezin a reşkirinê dike. Lê belê me careke din ispat kir ku derewan dike û di bin keşfa bi dehan balafiran de em fîlmên xwe dikişînin. Di demeke nêz de wê her kes fîlm bibîne. Di nava şer de em karê xwe dikin. Tiştek li pêşiya gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê, li pêşiya têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê nikare bibe asteng."… ***ANF***



## Gel li hember zulmê bi biryar e

Hozan SEYÎDXAN

Roj bi roj û her ku diçe zindanên rêjîma desthilatdar a AKP ê, werdigere navendên zulim û îşkençê.
Rêjîma faşîst a deshilatdara Akp ê ku vê zulim û zorê ji xwere weke metûtekê li dijî girtiyên kurd û azadîxwazan pêk tîne û hemî deriyên deng birînê li ber girtiyan asêkirine. Çima tercît di ser hemû pirsgirêkanre girinktir tê girtin, ji ber ku ev rengê tecrîd heman demê tê wateya tecrîda li ser civak, ziman û hebûna kurdan, kesayetên siyasî û girtiyên azadixwaz. Wek ku tê zanîn tecrîda li îmralî di çarceveya siyasî ya herî giran pêk tê. Ji ber vê egerê Kurdistaniyên li welat û yên li derveyi welat ji bo protestokirin û şikandina tecrîda li ser rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan li gelek dever û navendan ketine girevên birçîbûnê.
Çalakgirên grevên birçîbûnê dibên heta ku ev tecrîd bi dawî nebe ewê heman çalakiyên xwe bi zexim û hê xurtir bidûmînin. Wekîla kurd Leyla Guven dema ku biryara greva birçîbûna bê veger da, di destpêka peyama xwe de wiha anî ziman, "ez di çalakiya xwede xwedî helwest û biryarim, em weke jinên kurd da ku vê tecrîdê perçebikin bedel çi dibe bila bibe emê xwe ji vê tekoşînê re bikin pêşeng dîsa jî yên ku wê bi ser bikevin em bi xwe ne."
Leyla Guven bi vê çalakiya xwe, misoger kir ku ti car dîwarên zindanan nikarin dengên azadîxwazan bibirrin, çawa ku di berxwedana zindana Amedê de Kemal Pîr, Xeyrî Dûrmûş'an bi çalakiya xwe ew dîwarê zulim û zorê hilweşandîn û bi dirûşmeya berxwedan jiyane bi miloyanan gel li dû xwe şopandin, va îro jî bi miloyonan gel bi durûşmeya "em sîstema îmraliyê hilweşînin, bi rêbertiya xwere azad bijîn" heman berxwedan berdewame.
Gel dibêje dem dema xwedî li xwe û li rêbertiya xwe derketinê ye. Îroj li hemî qadan girseya gelê kurd ji bona şikandina tecrîdê li ser piyan e, hunermend û ronakbîr jî bi tevlêbûn û helwesta xwe ya van çalakiyan de dikarin roleke , xwe a pozitîf bilîzin. Ev jî tê wê watê ku bi şikandina vê tecrîdê re dawî li qirkirinên siyasî û çandî jî tên.
Rêjîma AKP'ê bi kiryarên xwe yên derî mirovatiyê ku êdî ne tenê Kurdsitan her wiha temamê Tirkyê xistiye zindaneke dorpêçayi û di Rojhilatanavîn de weke dewleta herî zulumkar û mafxur tê nasîn, ger çi bibe jî bila bibe wê ev zulim û zor dewam neke û xuyaye ku gelê kurd bi bexwedan û têkoşîna xwe xwedî biryare ku ewê vê pêvajoyê wergerîne pêvajoya azadî û serkeftinê.

# Rojane 100 nexweş tên dermankirin

**Tevî derfetên kêm û şer û êrîşan jî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li gel hemû xebatan xebatên xizmeta tendurustiyê jî dewam dikin. Navenda Tendurustiyê ya li herêma Ebû Xeşeb a Dêrazorê tevî derfetên kêm jî rojane xizmeta tendurustiyê dide 100 nexweşan.**



Navenda Tenduristiyê ya herêma Ebû Xeşeb tekane navenda tenduristiyê ya herêmê ye. Ev navend rojane xizmeta tendurustiyê dide 100 nexweşan.
Komîteya Tenduristiyê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Dêrazorê ji ber zehmetiyên çûyîna bajarê Hesekê, 1`ê Mijdara 2018`an Navenda Tenduristiyê ya Ebû Xeşeb vekir.
Gundê Ebû Xeşeb dikeve bakurê Dêrazorê. 120 km dûrî bajarê Hesekê û 120 km dûrî Reqayê ye. Ev navend li herêma Ebû Xeşeb tekane navenda tenduristiyê ye. Derman ji 60 – 70 gundan re pêşkêş dike.
Navenda Tenduristiyê rojane 100 nexweşan derman dike. Pirraniya nexweşiyên ku li navendê têne dermankirin nexweşiyên çerm û nexweşiyên jinan in. Her wiha dermanan ji kesên nexweş re pêşkêş dike.
Li navendê 15 hemşîre û bijîşkên nexweşiyên jinan û bijîşkekên nexweşiyên giştî hene. Tevî derfet û alavên xwe yên kêm jî navend derman û pêwîstiyên tenduristiyê ji nexweşan re peyde dike.
Serokê navendê Cûma Rebah diyar kir ku wan navend amade kir, dest bi dermankirina jinên ducanî û zarokan kir û li gorî derfetên xwe dermanan ji wan re pêşkêş dikin. Rebah diyar kir ku alav û derman ji wan re pêwîst in, ji ber ku her 6 meh carekê UNICEF ji wan re dişîne û zêdebûna hejmara nexweşan zextê li ser wan çêdike…*ANHA*

## Perwerdeya Studiyo bingeha afirandına pisporiya denge



**Melek DEMÎRTAŞ**

Dema ku çand û huner tê gotin destpêkê mûzîk tê bala mirovan, lê ew mûzîk anjî dengê xam tê û bi amûrên studyo dibe mûzîk û belav dibe. Studyo û amûrê wê ji nota deng û mûzîk di afrênin. Ser vê bingehê ku pisporiya deng û mûzkê li Rojava çêbibe wekî Çand û Huner ser 8 mehan dest bi perwedeya studyo kirine.

**DENGBÊJÎ JÎ XWEZAYE KURDAN HEYE**

Kompozyerê Mûzîka Filman û mamostê perwerdê Mehmûd Berazî ji Serê Kaniyê ser armanc û rêbazên perwerdê ev tişt anî ziman ku projeya perwerdê ji pêwîstiyek û avakirina pisporiya teknîka deng hate destpêkirin û wiha got: "Kurd di xwezaya xwe de ji bo avakirina deng amedeye, ji ber ku dîrok û çanda wî/wê ser dengbêjî ye mezin bûye. Bi vê mebestê jî me xwest ku studiyoke mezin avabikin, lê beriya ku studyo avabikin pêwîste binghek jêre hebe, ew bingeh jî endamên pispor û zanistê deng bin. Ji bo wê perwerde hate dest pêkirin, projeya avakirin û perwedekirina endman da ku binghek dengê mûzîka sînema û stran li herêmê giştî bê afirandin."

**STUDYO Û PERWERDE JÎ BO ÇÊKİRİNA DENGE**

Mehmûd diyar kir ku beriya 3 mehan perwerdeya studyo hatiye destpêkrin û wiha raber kir: "Ev perwerde ser 8 mehane û 4 endmên ku beriya niha jî di beşa mûzîkê de dixebitîn beşdarbûnê û ev sê mehin ku perwede hatiye destpêkirin û dê 5 mehê din berdewam bike. Perwerde ser 4 beşan re tê dayîn wekî (Erence, Edîtî, mîlodayîn û mîx) wê hemû endam erencê bizanibin yanî çêkirina stranê û di beşa xwe de jî pispor bin. Jiber ku her beşek zanisteke, raste ev her çar beş di xebatekî de hev temem dikin lê di heman demê de her beşek zanisteke û pisporî jêre pêwîste."

**PERWERDE SER 3 BEŞA NE**

Mehmûd bal kişand ser cûdahiya beşên perwerdê û wiha pêde çû: "Perwerdê ser 3 beşan tê dayîn wekî beşa yekemîn sê mehin perwede ser danesîna studyo, deng û amûrên teknolojî yên çêkirina denge û bi rengekî serkeftî bi dawî bû. Ya duyem afrînerî anjî avakirin berhemek nû, yanî tiştek xam bikin made, mînak nota mûzîk hatiye nivîsandin dê bikin deng anjî mûzîk. Ku di navbera 6 mehan de karîbûn xwe pêşbixin dê derbasî beşa dawî ji perwedê bibin. Ya sêyemîn jî 2 mehin ewê xwe bixwe mûzîk anjî albûmek çêbikin, piştî dawîkirina perwerdê bi temamî êdî dikarin ku asîstan anî çîgerkî xwe çêbikin û ew cîger perwede bikin."
Mehmûd Berazî diyar kir dê piştî vê perwerdê mamosteyekî ku di vî mijarî de pispor be ser van dayênên ku min dane temem bike û wiha bi dawî kir: "Da ku di Rojava de pisporên vî xebatî hebin, heye ku di akadimiyên çand û hunerê de dersên ser mûzîk anjî studyo bidin. Ev perwerde ser bingeha texesus anjî pisporî hate çêkirin, perwerdên mîna vî rengî her wê berdewam bikin."


**HİZKİRİN Û PERWERDE PİSPORÎ AVADİKE**

Endamê mûzîkê ji Hesekê Kawa Xalid jî yek ji endamê perwrê got: "Ez bi armanca frêbûna bingeha studyo tevlî bûn. Raste pêwîste hezkirin ji xebtaê re hebe, lê carne hizkirin têrênake; ji ber ku di Rojava de di milê teknîk taybet ya mûzkê de lawazî heye. Lê piştî vê perwerdê emê wan lawaziya derbasbikin, ku dema niha em li stranekê guhdra dikin êdî em dizanin pirsgirkê ji kure ji bo wê em dikarin çareser bikin."

## Mazot li welatiyên Reqayê tê belavkirin

Saziya SATKOP bi koordîneya meclîs û komînên bajarokê El-Himêrat bi bihayeke munasib mazotê li welatiyan belav dike.
Saziya SATKOP'ê xebatên belavkirina mazotê li welatiyên El-Himêrat berdewam dike û hindik maye ku beşa yekemîn bi dawî bike. Heta niha saziyê 440 hezar lître mazot belav kiriye.
Girêdayî mijarê çavdêrê xebatên belavkirinê Esed El-Meshûc wiha axivî: "Heya niha me 440 lître mazot li şêniyên Meclisa Rojava ya bajarok belav kiriye. Heta niha ji sedî 90 mazot li gel hatiye belavkirin. Piştî bi dawîbûna beşa yekem emê dest bi belavkirina beşa duyem bikin."
Saziya SATKOP'ê ji destpêka zivistanê ve xebatên belavkirina mazotê li welatiyên Reqayê berdewam dike…*ANHA*





### Tecrîd, despêka şerê 3. yê Cîhanê ye

Medeni FERHO

Şerê li Rojhilata Navîn, şerê cîhanê yê 3. ne. Her kes di vê babetê de hemfikîr e. Lê, heta îro kesekî destpêka vî şerê qirêj, ku navenda wê bûye Kurdistan ne aniye ziman. Kurd jî, tenê di çarçoveya exlakê rojane de nirxandinan dikin. Rast e, exlakê rojane pîroz e, lê di siyasetê de ev exlak nîne.
Her kes, destpêka şerê 3. yê cîhanê, 11 Îlona 2011an, êrîşa li dijî kuleyên dubirak yên Emerîka dibîne, ev kêm e...
Piştî êrîşê, serokê Emerîka W. Bush "şerê xaçparêzî" dikirand, lê zû tê vegeriya. Şer, wekî şerê şaristaniyan jî hate binavkirin, lê negirt. Belkî dibin cilê de û derxistina DAIŞê, berhemê gotina "şerê xaçparêzî" be, lê eşkere nebû.
Piştî êrîşa li Emerîka, Emerîka li Iraqê, tenê bi hêza xwe haraket kir. Bi bihara Gelan re rewş hinekî zelal bû. Lê piştî ku Komploya Navneteweyî kirin rojevê, rewş guherî.
Komplo destpêka şerê 3. yê cîhanê ye. Lê pratîka şerê cîhanê, piştî tecrîdê ye. Bi tecrîda li Imralî re, çeteyên DAIŞê derketin holê. DAIŞê berhemê, hêzên global û herêmê ye. Dewletên herêmê û Ewropa jî, çeteyên DAIŞê destek kirin.
Dema çeteyên DAIŞê, Musil dagir kirin û berê xwe da Suriye û Kobanê, dewletên Ewropa, herêmê û Tirkiyê, bi desteka xwe ligel DAIŞê bûn. Bi derketina çeteyên DAIŞê re, hêzên wek Rusya û Îranê, derketin meydana cengê. Meydana cengê jî Kurdistan bû.
Her kesî digot, netewe-dewlet wê werin biçûk kirin û Projeya Rojhilata Navîn ya Mezin di pratîkê de ye. Wexta ku, DAIŞ êrîşî nirxên mirovahiyê kirin û guhdariya efendiyên xwe nekir, hêzên global, bi taybetî Ewropa û Emerîka ketin nava tirsê.
DAIŞê, ji bilî Tirkiyê û Israîl li dijî her dewlet û lîderî gef xwarin. Piştî vê, Emerîka jî derkete meydana cengê. Êdî şerê cîhanê yê 3. bu holka berjewendiyan. Tirkiyê, ji roja pêşî ve, dibin cilê de DAIŞ destek dikir, piştî DAIŞê li Kobanê têk çû, Tirkiyê bi hêza eskerî dakete meydana cengê.
Balkêş e, her kesî, bi taybetî Tirkiyê, digotin Haraketa Azadiya Kurd, PKKe, rêkûpêkiya Rojhilata Navîn xera dike, dixwaze sinorên 4 dewletan ji holê rake, peymana Sykes-Pîcot tune bike. Tirkiyê, yek carê, DAIŞê jî wek terorîst bi nav nekir. Piştî şikandina DAIŞê, dewleta Tirk bû xwê û kete agir. Geh li Musilê xwest DAIŞê bi parêze, geh xwest li Kerkûk û Mexmurê, geh li Kobanê xwest çeteyan biparêze.
Rêxistinên îstîxbaratên Ewropa, di raporên xwe de hevkariya Tirkiyê û DAIŞê eşkere kirin. Dîse jî, deng derneket, vê jî dewleta Tirk degel kir û kete nava haraketê, tiştê ku çeteyên DAIŞê nikerîbû bike, Tirkiyê kir. Pêşî Başûrê Kurdistanê dagir kir, behane jî perwerdeya çekdarên PDKê bû. Gelo, li 27 baregehan perwerdekirina çekdarên PDKê maqul e?
Piştre, Tirkiyê êrîşî Efrînê kir û herêm dagir kir. Ev her du dagirkerî berterefkirina Peymana Sykes Pîcot in, kesî deng nekir. Li gel vê jî, Emerîka di kesayeta Birêz Cemil Bayik, Murat Karayilan û Duran Kalkan, li dijî pêşengên Haraketa Azadiya Kurd, biryara girtinê da.
Ev biryara Emerîka qonaxa duyemîn ya şerê cîhanê ya 3. ne.
Şerê sêyemîn yê cîhanê, ketiye qonaxek nû û kes nema dikare peymana Sykes-Pîcot biparêze. Sykes-Pîcot, rekihek polayî ya dîlgirtina gelan e. Tirkiyê hem hassasiyeta etnîkî, hem hessasiyetên teolojîk bikar tîne û êrîşî Kurdan dike.
Şerê cîhanê yê 3. vegeriya destîniya şerê yekemîn yê cîhanê û ketiye qonaxek trajîk. Ev qonax bi taybetî ji bo Kurdan û gelên li herêmê û tevahiya cîhanê kiriye rewşek dehşetengîz.



# Heta azadiya Ocalan wê têkoşîn dewam bike

**Çalakiyên greva birçîbûnê yên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dikin. Bi vê armancê Kongreya Star li herêma Şehbayê bi tevlêbûna bi sedan jinan çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin. Jinên ku tevlî çalakiyê bûn diyar kirin ku heta azadiya Rêber Ocalan ew ê têkoşîna xwe dewam bikin.**



Jinên ku bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtin pêkanîne, destnîşan kirin, ew dest ji fikir û felsefeya Ocalan bernadin û diyar kirin ku heta azadiya Ocalan ew ê tekoşîn û berxwedanê bidomînin.
Ji bo şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakî berdewam dikin.
Kongreya Star a kantona Efrînê jî ji bo piştgiriya çalakiya greva birçîbûnê ya parlementera HDP'ê Leyal Guven a ku di zîndana Amedê de girtî ye, li herêma Şehbayê bi tevlîbûna sedan jin greva birçîbûnê da destpêkirin.
Di çalakiyê de gelek jinên ku li Sûriyê di dîrokên cuda de bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re pêkanîne jî tevlî çalakiyê bûn.
Jina bi navê Zêno Xelîl (50), carekî li Lubnan û carekî jî li Helebê bi Ocalan re hevdîtin pêk aniye. Zêno diyar kir ku Ocalan kesek dilnizim û enerjiya erênî li herkesî derdorê xwe belav dikir.

**AZADIYA OCALAN AZADIYA ME YE**

Zêno wiha qala hevdîtinên xwe bi Ocalan re kir: "Ocalan di her runiştina xwe ya bi gel de, pêwîstiya sekinandina li hember pergalên deshilatdar û belavkirina fikra demokratîk di navbera hemû gelên Rojhilata Navîn destnîşan dikir."
Zêno pêwîstiya bilindkirina asta têkoşînê ya li dijî tecrîdê anî ziman û wiha got: "Azadiya Ocalan, azadiya me ye."

**LI DIJÎ TECRÎDÊ EM Ê LI BER XWE BIDIN**

Jina bi anvê Esmehan Resûl jî wiha got, "Me tehemulî hemû zextên rêjîma Sûriyê kir û me li ber xwe da. Heta em tecrîdê bişikînin emê li berxwebidin."
Her wiha Esmehan bang li hemû dewletên cîhanê yên ku behsa demokrasiyê dikin, kir ku ji bo rakirina tecrîdê bikevin nava tevgerê.

**HETA OCALAN AZAD BIBE**

Jina bi nave Gulê Cemo destnîşan kir ku tiştek li tevahiya cîhanê li hember têkoşîna wan ji bo jiyaneke azad nebe asteng û wiha axivî: "Komploya navdewletî fikrên Ocalan kirin hedef, lê em ê dest ji fikr û rêgezên Ocalan bernedin û heta dîtina Ocalan em ê li ber xwe bidin."
Gulê heta rakirina tecrîdê û azadiya Ocalan soza berdewamkirina têkoşînê da…*ANHA*

## Emê li dijî êrîşan li ber xwe bidin



Jinên Reqayê destnîşan kirin ku Erdogan bi gefên xwe yên dawî hewl dide aloziya Tirkiyê ya hundirîn derbasî dewletên cîran bike."
Nerazîbûnên welatiyên Bakurê Sûriyê li dijî gef û êrîşên dewleta Tirk zêde dibin. Jinên Reqa yê diyar kirin ku ew ê heta dawiyê li dijî êrîşên dagirkeriyê li ber xwe bidin. Jinên Reqayê destnîşan kirin ku armanca Tirkiyê ji van gefan, piştgiriya DAIŞ'a ku ber bi bi tune bûnê ve diçe ye.

**EM LI CEM QSD'Ê NE**

Endama Rêveberiya Jinan a Reqayê Zelîxa Ebdî destnîşan kir ku armanc ji van gefan dûrxistina bala cîhanê ji aloziya hundirîn a Tirkiyê ye û desteka çeteyên DAIŞ'ê ye ku di rojên xwe yên dawîn de ne.
Zelîxeyê wiha got: "Herêmên ku bi saya xwîna şehîdan hatine parastin, ewle ne. Wek şêniyên bajarê Reqayê em ê piştgiriya QSD'ê bikin."

**EMÊ BI YEKÎTIYÊ ÊRÎŞAN TÊK BIBIN**

Endama Rêveberiya Jinan a Reqayê Meryem El-Ebo diyar kir ku Tirkiye hewl dide tevliheviyê di navbera gelê herêmê de derxe û ev tişt anî ziman: "Em hemû armanca Erdogan a di navbera gelên herêmê de tevliheviyekê derxîne, dizanin. Lê bi yekitiya xwe em ê armancên Erdogan têk bibin."
Meryem di serî de koalîsyon, bang li dewletên cîhanê kir ku li hember gefên li dijî herêmên ewle û rizgarkirî helwestên xwe nîşan bidin.

**EMÊ LI DIJÎ ÊRÎŞAN BISEKININ**

Endama Rêveberiya Jinan a Reqayê Emîne Hemdan jî diyar kir ku Tirkiye desteka terorê dike û komên çete şandine herêmên Bakurê Sûriyê û wiha got: "Bi vê yekê hewl dide vîna gelê herêmê bişkîne. Dewleta Tirk niha dizane ku dawiya terorê nêz bûye. Ji ber wê bi êrîşên li dijî herêmên Bakurê Sûriyê yên ewle dest bi mudaxeleya kar û barên Sûriyê dike."
Emîna wiha dewamkir: "Tirkiye bi van gefan hewl dide tevliheviyê di herêmê de çê bike. Lê vîna me ji gefên Erdogan bihêztir e û em ê li dijî êrîşan li ber xwe bidin."
Di dawiyê de Emîne bang li hemû gelên herêmê kir ku yekitiya xwe ava bikin û li hember êrîşan bisekinin…*ANHA*



## Em ê xwîna şehîdên xwe li erdê nehêlin

KJK'ê ji malbata ku di êrîşa dewleta Tirk ya li ser Mexmûrê de şehîd bûn re sersaxî xwest û got, "Em ê xwîna wan li erdê nehêlin." KJK'ê diyar kir, gelê Mexmûrê bi sekna xwe ya xurt nîşan da ku wê ti carî serî li ber dagirkeran netewîne.
Balafirên şer ên artêşa Tirk roja 13'ê Kanûnê bombe li kampa penaberan a Mexmûrê barandin û di encamê de ji heman malbatê çar kes şehîd bûbûn.
Konseya Rêveber a Komalên Jinên Kurdistanê (KJK) nameyek ji malbata dayika Mihemed re şand û sersaxî jê re xwest.
KJK'ê bal kişand ser êrîşên qirkirinê yên rejîma Erdogan ku bi tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest pê kiriye û li Bakur, Rojava û Başûrê Kurdistanê bi rê û rêbazên cuda didomîne.
Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku gel her şêweyên zext û zordariya dewleta Tirk, gelê Mexmûrê serî li ber dagirkeriyê netewandiye, rêya namûs û rûmetê hilbijartiye û nirx û rûmeta xwe parastiye.
KJK'ê diyar kir, ev sekna gelê Mexmûrê weke nexweşiya penceşêrê di bedena Erdogan û rejÎma wî de digere, lewma Mexmûr bûye yek ji hedefên sereke yên dewleta Tirk.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin, gelê Mexmûrê di nava têkoşîna azadiyê de her tim li refên herî pêş e û li her malbatê şehîdek, li hinekan jî gelek şehîd hene.
Konseya Rêveber a KJK'ê da xuyakirin ku yek ji van malbatan jî di êrîşa dawî ya dewleta Tirk de şehadetên giranbuha da û got, "Em di destpêkê de bi navê tevgera jinê KJK'ê sersaxiyê ji hemû ferdên malbatê re û ji gelê me yê li Mexmûrê re dixwazin. Em soz didin ku xwîna wan wê li erdê nemîne û dibêjin; êşa we êşa me ye. Em vê malbatê weke malbateke bi rûmet nas dikin ku bi sekna welatparêziyê di têkoşîna azadiyê de xwedî cihekî taybet e."
KJK'ê helwesta gelê Mexmûrê ya li dijî êrîşa dewleta Tirk weke seknekê bi heybet pîroz û silav kir û wiha dewam kir: "Em di wê baweriyê de ne, çawa ku berî bi 25 salan xwe radestî faşîzmê nekir, serî netewand û hêviyên faşîzmê têk bir, bi sekna xwe ya îro jî peyameke xurt daye serçete Erdogan. Hemû planên wî têk bir û nîşan da ku wê ti carî nikaribe wan ji doz û nirxên xwe qut bike. Em careke din dibêjin, bi navê Komalên Jinên Kurdistanê, em ê tola wan hilînin. Sala 41'ê ya PKK'ê wê bibe sala têkbirina faşîzmê û azadkirina Rêber Apo."



### Xwe parastin mafekî herî rewa ye

Avesta AMARGÎ

Em di demeke wisa de derbas dibin, mirov her kêliya ku tê de dijî, hewcehî bi analîzên Rêber Apo yên di derbarê tekoşîna gelê Kurd û rojhilata navîn de kirine dibîne. Ya ku gelê Kurd, û rojhilata navîn ji vê qirîza tê jiyîn rizgar bike jî dahûrandin, tespît, tehlîl û rêya çareseriya ku Rêber Apo pêşkêş kirî ye. Rêber Apo, di dahûrandinên xweyî dema derbas bûyî de li ser bûyîna xwedî hêzê gelek radiweste. Ji bo şerê şoreşgerî yê li Kurdistanê dest pê kiriye jî li ser bingeha tespîteke wiha dide rûnişkandin. Rêber Apo wiha dibêje; 'Ger hêza me bi qasî em dinyayê fetih bikin hebê jî, em êrîş nakin, lê ger dinya werê ser me, emê heya dawî li berxwe bidin û parastina xwe bikin." Ev perspektîf li gor rewşa niha li Kurdistanê tê jiyîn derbasdare.
tevgera azadiya kurdistanê, roja ku dest bi tekoşînê kir û şûnde şer, li ser hişmendiya bîra, xwe parastinê dest pê kir. Di ser vê tekoşînê re 40 sal derbas bû, lê hîna jî tekoşîn bi hemû dijwariya xwe li her çar perçeyê kurdistanê, bi vê hişmendiyê berdewam dike.
Rêber Apo, di gelê Kurdistanê de, hişmendiya parastinê, serî de di fikir, bawerî û hêvî avakirinê de ava kir û ev yek bi awayekî mukemel bi serxist. Derketina tevgera Apogeriyê, ji bo gelên Kurdistanê, beriya her tiştî derketinekî xwe parastinê bû. Ango bi parastinê vegera li hebûna xwe bû. Ev heqîqet, bi kedeke bê hempa ya Rêber Apo re, bi ser ket. Ev meşa gelê Kurd, ku weke meşekî meratonî hate bi navkirin li ser bingeha xwe parastinê û pêşxistina parastinê bi pêşde çû. Di vê meşê de li ser gelê Kurd û tevgera wê, hêzên dagirker bi hezaran rêbaz ceribandin, da ku ev meş bi sernekeve, lê tu rêbaz nehat bi serxistin, ji ber gelê Kurd êdî çeka xwe parastinê fêr bûbû. Dizane êdî, wê çeka parastinê li kuderê, hemberî kê û çawa bi karbîne.
Gelê Kurd, bi gelek bedelên giranbuha hişmendiya parastinê, avakir û xwe gîhand van rojan. Ev avakirin, li xweşa tu hêzekî ku tiliya wan di dagirkirina Kurdistanê de heyî ye neçû û naçe. Pergala kapîtalîst, hişmendiya nijedeperest û dewletparêzên qirker, roja îro li hemû Kurdistanê hêza êrîşkirinê xistine dewrê û bi van êrîşan jî, dixwezin kurdistanê, ji hişmendiya parastin û xwebûnê qut bikin. Ji bo vê bikin, çi ji destê wan tê dikin. Dîsa Rêber Apo di parêznameya xweyî dawî de girêdayî parastinê diyardeyek din wiha aniye ziman; Ger civakek ne rêxistin kirî be nikare xwe biparêze, ger nikare xwe biparêze, wê weke mirîşka serîjêkirî lê werê.'
Ev diyarde raste rast rewşa rojavayî Kurdistanê ango Bakûrê Sûrî radixe ber çavan. Eger gelên Bakûrê Sûrî, asta rêxistinkirina pergala xweyî heyî baş di nava ahengiyekê de biherikîne û di ronahiya perspektîfên Rêber Apo de biparêze, wê her êrîşa ku pêşbikeve mahkûmî binkeftinê û vala derxistinê bibe.

# Divê gelên Sûriyê li dijî êrîşan yekîtiya xwe ava bikin

**Hevserokê Meclîsa Zagonsaz ê Herêma Efrînê Silêman Cafer derbarê gefên Tirkiyê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de axivî û diyar kir ku gelên Sûriyê wê li hember êrîşan li ber xwe bidin. Cafer got, “Girînge ku gelên Sûriyê li dijî van gef û êrîşên Tirkiyê yekîtiya xwe ava bikin.”**

**Idrîs HENAN**

Hevserokê Meclîsa Zagonsaz ê Herêma Efrînê Silêman Cafer derbarê gefên Tirkiyê ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de got: Dewleta Tirk piştî itîfaqa bi Rûsya li Soçî, gefên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde kirin.

### BI BUHANEYAN TERORÊ DIPARÊZE

Cafer projeya Tirkiyê ya dagirkeriyê şîrove kir û got: Ji aliyê deryaya Spî ve li ser sînorên parêzgeha Sûriyê Lazîqiyê nav li çiyayekî kiriye Çiyayê Tirkmenan. Bi vê hîncetê bergehek xwe li wir ava kir. hêdî hêdî bi desteka Rûsyayê tevahî herêmên ku dikevên rojavayê çemê Firatê ji Cerablus ta Iskenderonê dagir kir. Ji bo ku vê projeya xwe dewam bike niha berê xwe daye herêmên li rojhilatê çemê Firatê. Cafer hîncetên rejîma AKP derewandin û got: Tirkiyê her bi buhaneya şerê li dijî terorê êrişî herêmên dîtir dike. Her kes dizane terorîst kesê ku êriş dike ne kesê ku xwe diparêze ye.

### BI GEFAN PIŞTGIRIYÊ DIDE ÇETEYAN

Hevsrokê Meclîsa Zagonsaz ê Herêma Efrînê Silêman Cafer tekez kir ku gefên Erdogan cidî ne û wiha dewam kir: Kengê çeteyên DAIŞ tengezar dibin Erdogan dikeve dewrê. Dizane bi tunebûna DAIŞ re rejîma wî jî tune dibe. Bi van gefan bêhn dide DAIŞ`a nav xwe û ji çeteyên li Idlibê re tekez dike ku ew ê wan nefiroşe. Cafer di nav nirxandinên xwe de got: Eger were û rejîma AKP êriş bike wê çaxê mirov dikare bibêje ku rejîma Sûriyê, Rûsya û Amerîka lempeya kesk jê re vêxistine.

### RÛSYA TIRKIYÊ DIŞUXILÎNE

Cafer seferberiya ku Rêveberiya Xweser ragihandiye erênî nirxand û got: Jixwe piştî dagirkirina Efrînê em di nava seferberiyê de ne. Daxuyaniya Rêveberiya Xweser hevgirtina gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û niyetên wan ên avakirina Sûriyeke hevgirtî nîşan dide. Her wiha rejîma Sûriyê jî datîne beramberî erkên xwe yên neteweyî hele ka kî yekîtiya axa Sûriyê diparêze. Derbarê mewziyên hêzên weke Rûsya û Amerîka de Cafer got: Di cewher de Sûriyê navbera hêzan de pratîkî parçe bûye. Li rojavayê çemê Firatê Rûsya û li rojhilat jî Amerîka serwer e. Herdu jî ji bo berjewendiya xwe rejîma AKP li hemberî hev dişuxilînin. Gefên Tirkiyê di cewher de gefên Rûsya li dijî Amerîka ne. Lê herdu hêz di xetên stûn de nayên ber hev. Tenê hêzên nola Tirkiyê û Îranê li hember hev dixebitînin.

Silêman Cafer Hevserokê Meclîsa Zagonsaz ê Herêma Efrînê di dawiyê de got: Çawa li Efrînê em li ber xwe didin, em ê ta dawiyê hevgirtina xwe li hemberî êriş û gefên Tirkiyê li ber xwe bidin. Gelên Sûriyê mecbûrî yekîtiyê ne.



## Li dijî êrîşên dewleta Tirk em bi QSD’ê re ne



Şêxê Êla El-Bû Essaf, Ubeyd Xelîl El-Hesan piştgiriya xwe ya bi QSD’ê re destnîşan kir û diyar kir ku ew amade ne li dijî her êrîşekê li ser xaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştgirî bidin QSD’ê.

Şêxê Êla Ereban a El-Bû Essaf, Ubeyd Xelîl El-Hesan li ser gefên Serokê rêjîma Tirk a dagirker Erdogan axivî û destnîşan kir ku Erdogan dixwaze hevgirtina civakî ya li herêmê biguhere û teqez kir ku li hemberî her êrîşekê li ser xaka Bakur û rojhilatê Sûriyê wê li rex QSD’ê cih bigirin û re nadin Erdogan bikeve xaka wan.

Şêx Ubeyd gotinên xwe wiha dewam kir: “Gefên Erdogan ne yên yekemîn in, lê belê ji dema ku QSD’ê herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji çeteyên DAIŞ’ ê rizgar kiriye û heta niha, Erdogan gefan li herêmê dixwe. Tê zanîn ku Tirkiye destgirê tekane yê terora li herêmê ye û hemû êlên herêmê jî vê rastiyê dizanin. Sînorên Tirkiyê ji bo derbasbûna çeteyên terorê hatin vekirin.”

### EM LI CEM QSD’Ê NE

Şêx Ubeyd, armanca gefên Erdogan wiha nirxand: “Di demek ku çete ber bi xilasbûnê ve diçin de, Tirkiye gefan li herêmê dixwe. Ev jî piştgiriya Tirkiyê ya ji bo çeteyan nîşan dide.”

Şêx Ubeyd diyar kir ku wan ji destpêka derketina çeteyan heta niha piştgiriya QSD’ê kiriye, wan gelek şehîd dane û ew nahêlin Erdogan jî derbasî herêmê bibe.

Di dawiya axaftina xwe de Şêx Ubeyd ev tişt anî ziman:”Erdogan dixwaze hevgirtina civakî ya herêmê têk bibe. Lê çawa ku me piştgiriya QSD’ê di şerê li dijî terorê kir, îro jî em ê li hember êrîşên Erdogan bisekinin û nehêlin ku derbasî xaka me bibe.”…*ANHA*

# Tirkiye ne tenê ji bo Kurdan ji bo hemû Cîhanê metirsiyeke

Berpirsyarê Têkiliyên Derve yê TEV-DEM’ê Salih Muslim diyar kir ku di nava dewleta Tirk de zîhniyeta Îttîhat û Terakkî xwe nû kiriye û got, ev yek hem ji bo Kurdan, hem jî ji bo Rojhilata Navîn metirsiyeke mezin e.

Berpirsyarê Têkiliyên Derve yê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Salih Muslim, li ser gefên Serokê rêjîma Tirk Recep Tayîp Erdogan axivî û gefên Erdogan weke “îlana şer li dijî hemû Kurdan” bi nav kir û diyar kir, ya ku dewleta Tirk dixwaze bike “Nûkirina zîhniyeta Îttîhat û Terakkî” ye.

Muslim got, “Erdogan piştî ku li Tirkiyê hemû erk bi dest xist, plana xwe xiste dewrê. Bi MHP, Ergenekon, Hîzbûllah û hemû sûcdarên şer ên salên 90’î re tifaq kir. Li gorî me, rêxistinbûna Îttîhat û Terakkî ya destpêka sedsala 20’an ji nû ve xist meriyetê. Wê wextê Ermenî û Suryanî hatin qirkirin û Rûm ji Anatoliyê hatin derxistin. Kurd man, niha jî bi Îttîhat û Terakkî ya nû dixwaze Kurdan qir bike.”

### ERDOGAN METIRSIYEKE LI SER HEMÛ GELAN

Muslim got, “metirsiyeke mezin li pêşiya Kurdan e” û wiha dewam kir: “Zîhniyeta Îttîhat û Terakkî bi mejiyê ‘Kurdê herî baş Kurdê mirî ye’ tevdigere. Ji bo Kurdan ji bilî berxwedanê rêyeke din nîne. Ti Kurd nikare bêje tiştek bi min nayê. Dema ku qala qirkirinê tê kirin, ji bo wan filan partî, filan nêrîn an jî meyl ne girîng e.” Muslim bal kişand ser gotina Erdogan ku got “Kurdên terorîst” û diyar kir, “Ev gotin bi zanebûn hatiye gotin.” Muslim anî ziman, gefa tê xwarin ne tenê li dijî Kurdan e.

Salih Muslim bi dewamî got, “Metirsiyeke mezin li ser Kurdan heye, lê belê ev yek ne tenê li ser Kurdan e. Li ser hemû gelan metirsiyeke mezin heye. Mesela, niha li Îdlibê zilmê li gelê Ereb dikin, li deverên din zilmê li hinekî din dikin. Yek ji armancên bingehîn ên Îttîhat û Terakkî ya nû pêkanîna Mîsakî Millî ye.”

### EM PIŞTA XWE DISPÊRIN GEL

Der barê gefên li ser Bakurê Sûriyê jî Muslim got, “Em nizanin bê di navbera DYE û Tirkiyê de li pişt perdeyê çi diqewime” û diyar kir, gelên li herêmê ji bilî hêza xwe, pişta xwe bi kesî germ nake. Muslim got, “Ya ku li Efrînê li ser serê me bariyan, bombeyên NATO’yê bû” û wiha dewam kir: “Ji bo Kurd tiştekî bi dest nexin, Tirkiye di nava hewldanên cuda de ye. Geh xwe dide aliyê NATO’yê, geh aliyê Rûsyayê. Siyaseteke pragmatîk dimeşîne. Tirkiye hem li hundir, hem jî li derve asê bûye û hewl dide bi rêya şer xwe ji vê rewşa tengavbûyî rizgar bike. Li bendê ye ku êrîş û gefên li dijî me bên pejirandin. Em bi hêza gelê xwe, bi rêxistinbûn û berxwedana xwe piştrast in. Tirkiye bi vê siyaseta xwe ne tenê ji bo Kurdan, ji bo hemû Rojhilata Navîn û cîhanê metirsî ye.”…*ANF*




# Dewleta Tirk ji bo tevahî Sûriyê xeteriyek e

Endamê Desteya Rêveber a Partiya Yekîtiya Suryan Afram Îshaq diyar kir ku dewleta Tirk gefên binpêkirina xaka Sûriyê dixwe û anî ziman ku pêwîste hikûmeta Sûriyê li hember van gefan bêdeng nemîne.

Serokê rêjîma Tirk Recep Tayîp Erdogan 12’ê Kanûnê gefa operasyoneke leşkerî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwar. Endamê Desteya Rêveber a Partiya Yekîtiya Suryan Afram Îshaq têkildarî vê mijarê axivî û diyar kir ku gefên Tirkiyê li ser tevahiya xaka Sûriyê xeteriyek e, ji bo rê li ber dagirkriyê were girtin, parastin û têkoşîn pêwîst e.

Afram Îshaq diyar kir gefên Erdogan ji bo tevahiya xaka Sûriyê xeteriyek e, ji ber ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşek ji erdnîgariya Sûriyê ye.



Îshaq da zanîn ku Tirkiye ji bo vejandina imparatoriya Osmanî li herêmê, gefa êrîşan dixwe û Gefên dawî yên Erdogan yên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê şermezar kir.

Îshaq di berdewama axaftinên xwe de destnîşan kir ku pêwîste her kes ji guhertinên ku îhtîmale di rojên pêş de derkevin amade bin.

Îshaq anî ziman ku gefên Tirkiyê ne tenê li dijî partiyekî yan jî pêkhateyekê ye, di heman demê de hemû pêkhateiyên herêmê dike hedef û got, “ji ber wê divê hemû hêzên siyasî, civakî û sivîl yekîtiya xwe ava bikin û bi hemû şêwazên rewa herêmê biparêzin û bi hewldanên derxistina fitne û fesadiyê neyên xapandin.”

Îshaq wiha dewamkir: “Dema dewleta Tirk êrîşî Cerablus kir û ew dagir kir Kurd li wir tunebûn. Ji ber wê projeya Erdogan hemû erdnîgariya Sûriyê ye. Ji lewre pêwîstiya me bi yekîtiyeke niştimanî heye da ku li hember gefên Tirkiyê bisekinin û herêmên xwe biparêzin.”

Endamê Desteya Rêveber a Partiya Yekîtiya Suryan Afram Îshaq gotinên xwe wiha bi dawî kir: “Dewleta Tirk ji bo tevahî xaka Sûriyê xeteriyek e, dagirkirina Ezaz, Cerablus, Bab û Efrînê mînaka herî ber bi çave. Ji lewre divê hikumeta Sûriyê û hemû hêzên neteweyî yên Sûriyê li hember gefên Tirkiyê bisekinin. Ji ber ku Tirkiye xaka Sûriyê dagir kiriye.”



# Em ê li dijî êrîşan axa xwe biparêzin

**Endamên sazî û meclîsên bajarokê Til Hemîsê bi daxuyaniyekê êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê şermezar kir. Di daxuyaniyê de hat gotin ku wek gelên herêmê yên Ereb, Kurd, Suryan û Tirkmen, li dijî êrîşan emê, ax û destkeftiyên biparêzin.**



Endamên saziyên sivîl û meclisên navçeya Til Hemîs gefên Tirkiyê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê şermezar kirin û wiha gotin: “Emê li dijî êrîşên Tirkiyê axa xwe biparêzin.”

Endamên saziyên sivîl û meclisên navçeya Til Hemîs a girêdayî kantona Qamişlo daxuyaniyek dan û gefên Tirkiyê yên li ser xaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê şermezar kirin. Daxuyanî li pêşiya meclisa navçeya Til Hemîs ji aliyê hevserokê meclisa bajarok, Ekaz Ehmed El-Şetî ve hate xwendin:

Daxuyanî wiha ye:

“Piştî ku QSD`ê rêya revê li bajarokên Hecîn û El-Şefê li rojhilatê Sûriyê bi ser DAIŞ`ê de girt, gefên Tirkiyê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk hatin.

Tirkiyê di aloziya Sûriyê de îsbat kir ku ew piştgiriya terorê dike û bi rêya wê armancên xwe pêk tîne û roleke sereke di aloziya Sûriyê de lîst.

Wek gel, meclis û saziyên Til Hemîsê, em gefên Tirkiyê yên li dijî herêmên me bi tundî şermezar dikin û diyar dikin ku armanca gefên Tirkiyê belavkirina tevliheviyê û têkbirina ewlehiya li herêmê ye.

Wek gelên herêmê yên Ereb, Kurd, Suryan û Tirkmen, êrîş ji ku derê bên bila bên, em ê parastina xwe, ax û destkeftiyên xwe bikin. Em amade ne li pêşiya êrîşên dijminan yên li ser herêmên xwe bisekinin, em ê li pêşiya her cure êrîşên li ser gel û xaka me, yên ji aliyê dewleta Tirk de, bisekinin.”…*ANHA*

## Divê li hemberî tecrîdê em tekoşînê bilind bikin

Hevserokê Giştî yê HDP’ê Sezaî Temellî berxwedana Leyla Guven silav kir û got, “Dema ku em dibêjin bila tecrîd rabe, em bang li tevahiya Tirkiyê dikin. Werin li hemberî vê tecrîdê em dengê xwe bilind bikin.”

Hevserokê Giştî yê HDP’ê Sezaî Temellî li bajarê Qersê yê Bakurê Kurdistanê bi gel re civiya.

### LEYLA GUVEN HATE SILAVKIRIN

Temellî bi silavkirina Leyla Guven dest bi axaftina xwe kir a ku li hemberî tecrîda Îmraliyê ketiye greva birçîbûnê.

Temellî di axaftina xwe de wiha got: “Îro berxwedana parlementera me Leyla Guven dikeve roja 41’ê. Em hezkirin û silavên xwe jê re dişînin. Leyla Guven ne bi tenê ji bo me, ji bo hemû Tirkiyê tevgereke mînak dide nîşandan. Em bang li Tirkiyê dikin, werin em bi hev re li dijî vê tecrîdê dengê xwe bilind bikin.”

### MÛXATAB OCALAN E

Temelî diyar kir ku kesê ku dikare vî şerî bi dawî bike, mûxatabê çareseriya doza Kurdan e û got, “Em ji mûxatabê vê meseleyê re, ji Ocalan re hezkirina xwe dişînin. Li 5,6 sal berê binêrin. Berê çawa bû, niha çawa ye? Dema mirov herduyan dide ber hev, dibîne ku divê tecrîd were rakirin.”




### JI BERMAHIYÊN DAÎŞ’Ê RE DIBÊJIN ARTÊŞA MILLÎ

Niha bi nêzikbûna hilbijartinê re, sewqiyatên leşkerî dikin û gefan li gelê Kurd dixwin. Niha çeteyên OSO’yê Efrînê dagir dikin. Lê ji çeteyên OSO’yê re dibêje ‘artêşa millî’. Ev ne artêşa millî ne. Ev çete û bermahiyên DAÎŞ’ê ne.

Niha ev kes dîsa Rojava dikin hedef. Çima? Ji ber ku hilbijartin heye, pêdiviya wan bi serkeftinê heye. Ev desthilatdarî serkeftinê di xwîna Kurdan de digere. Ka tu serkeftinê di aştî û demokrasiyê bigere. “

Hevserokê Giştî yê HDP’ê Sezaî Temellî bang li gelên Tirkiyê kir ku bila li hemberî şer dengê xwe bilind bikin.

# Ciwanên Minbicê li ber dagirkeriya dewleta Tirk rabûn

Ciwanên Minbicê li dijî gefên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê li stada bajêr kom bûn û daxuyaniyek dan çapemeniyê.

Ciwan bi pankartên “Jinên Ciwan serî radikin, li dijî faşîzma Tirk li ber xwe didin” û “Bi ruhê ciwanên şoreşger serî rake, têbikoşe, dagirkeriya Tirk hilweşîne” beşdarî daxuyaniyê bûn.

Daxuyanî ji aliyê Hevserokê Meclîsa Ciwanên Minbicê Selah Cûma ve hate xwendin û wiha tê gotin; “Em ji Erdoganê faşîst û hikûmeta wê re dibêjin di êrîşa li ser xaka me ya pîroz de berdelê wê çi dibe bila bibe em ê mafê xwe yê parastina rewa bi kar bînin. Ji ber ku yê li vir bimîne em in û yê tune jî bibe hûn in.”

Di dewama daxuyaniyê de wiha hate gotin;

“Em ji vir heya Dêrikê seferberiyê radigihînin û bi yekdengî tevî hemû pêkhate û etnîkên xwe dibêjin ‘Na ji dagirkeriya Tirkiyê re. Em bang li kesên Sûriyê dikin ku li hember dagirkirina xaka xwe bibin mertal, xak û welatê xwe biparêzin.”



## Dagirkeriya Tirk tenê bi berxwedanê dikare bê rawestandin

**Zekî BEDRAN**

Dewleta Tirk eşkere kir ku wê êrîşî rojhilatê Feratê bike got ku ji bo vê amadekariyan dike û hêzên xwe li ser sînor komkiriye. Berî niha jî Erdogan li pêş ragihandinê û gelek platformandan de got ku wê êrîşî Bakurê Sûriyê bike û gelê li wir û saziyên demokratîk ku ava bûne belav bike. Erdoganê ku dibêje bila li Îdlibê agirbest bibe, çareseriya siyasî bê dîtin û koçberiya nû nebe, ji bo Bakurê Sûriyê jî ku herêma herî bi ewleye û gel bi hevre bi awayekî demokratîk û aştiyane dijîn qîr dike û dibêje ku wê dagir bike. Di bin vê êrîşkariyê de dijmintiya li Kurdan heye. Me ev yek gelek caran anî ziman. Erdogan û koma wî timî dibêjin “Şaşitiya ku me li Bakurê Iraqê kir emê li Sûriyê nekin.” Li Bakurê Iraqê Kurdan statuya federasyonê bi destxistibûn. Ji bo Rojava gotin “wê Kurd bi ti awayî nebin xwedî statû û ev xeta me ya sor e.” Niha Bakurê Sûriyê rêveberiyeke herî baş ava kiriye, vê pêş dixe û ji bo hemû Sûriyê jî weke modelekê pêşniyaz dike. Projeyeke yekîtî û demokartîk ya Sûriyê pêşkêş dike. Tê gotin ku hemû gel, bawerî û çand bi awayekî azad xwe bi rêxistin bikin û bi nasnameya xwe bi hevre bijîn. Eşkere ye ku ev model hem ji bo Sûriyê û hem jî ji bo Rojhilatanavîn vebijarka herî azadîxwaz û mayînde ye.

Dewleta Tirk di vê dema ku DAIŞ ber bi dawiyê ve diçe artêşa xwe li ser sînorê Sûriyê komkiriye û dibêje ezê êrîş bikim. Ragihandin aniye ser sînor, raya giştî ya der û hundir ji bo şer amade dike. Lê belê Tirkiye tenê bi hêza xwe nikare ewqas bê perwa bibe. Bi taybetî peymanên veşartî yên Rûsyayê bi dewleta Tirk re rê li ber vê yekê vedike. Îran ji xwe dijminê Emerîka ye, rêjîm jî girêdayî Îran û Rûsyayê ye. Ev hêz dibêjin “bila dewleta Tirk êrîş bike û Bakurê Sûriyê belav bike. Emerîka û Koalîsyon jî çawa li Efrînê li hember dewleta Tirk helwest nîşan nedan û gotin me eleqeder nake û pêşiya dagirkirinê vekirin, niha dîsa Tirkiye zextê li wan dike ku bikevin heman rewşê. Emerîka wê heta kîderê bi Tirkiyê re li hev bike an jî pevbiçe ne diyar e. Lê Îran û Rûsya berê Tirkiyê didin ser Bakurê Sûriyê û hewl didin hebûna Emerîka ya li Sûriyê lewaz bikin. Êrîş û dagirkeriya Tirkiyê ew ê Sûriyê bixe nava pevçûn û aloziyê. Yên ku behsa agirbest û çareseriya siyasî dikin dema mijar dibe Kurd bêdeng dimînin.

Divê rewşê de bar dikeve li ser milê gelên Sûriyê. Hêzên serdest hewl didin ku berjewendiyên xwe biparêzin û bandora xwe ava bikin. azadî, demokrasî û bi hevre jiyana gelan ne xema wan e. Lê yên ku mayînde bibin û bi hevre bijîn gelên li ser vê axê ne. Divê hemû gel li dijî van polîtîkayên xwînî, tarî û berjewendîparêz şiyar bin û dest bidin destên hev. Tê zanîn ku gelê Kurd hê zêde zana û birêxistinkiriye. Her ku diçe Asûrî, Suryanî û Ereb jî tevli vê dibin. Di wan de jî danehev û ezmûnek ava dibe. Fêrî xwe bi xwe birêvebirinê dibin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hêzeke ku li ser wan hukum û serdestiyê bike nemaye.

Di demeke kurt de ezmûna jiyaneke azad û demokratîk bidestxistin. Ji ber vê yekê di serî de Kurd divê hemû gel li dijî komkujî û dagirkeriya dewleta Tirk bi rihê seferberiyê bikevin nava tevgerê. Divê destûrê nedin ku destkeftiyên wan bên tunekirin. Tirkiyê çeteyên bermahiyên DAIŞ û El Nusrayê jî girtiye cem xwe. Ev kom êdî ne Sûriyeyî ne û bûne hêzên paramîlîter yên Tirkiyê. Divê ji netewperestî û lîstikên ku gelan bi hev bidin qirkirin re destûr neyê dayîn.

Dema ku Tirkiye êrîş bike eşkere ye ku wê mirin û weranî pêk were. Azadî û demokrasî bi hêsanî nayê bidestxistin. Gelên Sûriyê şer naxwazin. Hêzên mîna dewleta Tirk şer ferz dikin. Ti mafekî Tirkiyê li ser Sûriyê tune ye. Hiqûqa navnetewî û hiqûqa dewletan didin bin lingan. Berdêla wê giran be jî ji bo ku hebûna xwe biparêzin divê li dijî hêzên zordest û zalim bisekinin. Ti gel ji hêzeke dagirker re nabêje kerem bike were û tiştên ku dixwaze bike. Yên ku ji bo azadiyê berdêlan didin, wê azadiyê biparêzin û li xaka xwe jî xwedî derkevin. Divê gelên Sûriyê hemû hêza xwe, bala xwe û dema xwe bide ser berxwedana li dijî dagirkeriya dewleta Tirk. Divê her mal, her tax û her kolan bibe çepereke berxwedanê.